

Benda 7.

Hemû mirov li ber yasayê wekhev in û hemûyan, bê tu cidahî, mafê parastineke yasayî ye wekhev heye. Hemû mirov li hemberî her cidahiyeke ku vê Danezanê binpê dike û li hemberî her navtêdana cidahiyeke wilo xwediyê mafê parastineke wekhev in.

Benda 8

Herkesî maf heye ku li hemberî kirinên ku mafên bingeîn yên ku yasa an destûr jê re dinasin binpê dikin serî li dadgehên neteweyî yên serwer bixe.

Benda 9.

Nabe tukes bi awayekî remekî bête girtin, bindestkirin an sirgûnkirin.

Benda 10.

Herkesî, di wekheviyeke tewaw de, maf heye ku doza wî li ber dadgeheke serbixwe û bêla bi awayekî rewa û aşkere bête bihîstin ji bo diyarkirina maf û erk-ên wî, û her cure tawanbara li dijî wî.

Benda 11.

1. Herkesê ku bi tawanekê tete gunehbarkirin maf heye ku bêguneh bête hesibandin ta ku sûcê wî di dadgeheke aşkere de, ya ku hemû mercên ji parastina wî re pêwîst misoger kiri be, bi awayekî yasayî were çesandin.

2. Nabe tukes ji ber kirin an nekirina karekî, ku di gava pêkhatina wî de li gora yasaya neteweyî an navneteweyî ne sûc bû, bête gunehbarkirin. Herweha nabe sizayeke ji wê sizayê, ya ku di dema qewimandina tawanê de hebû, tuntir pê bête dan.

Benda 12.

Nabe ku tukes toşî destêwerdana remekî ya nav jiyana wî ya taybet, malbata wî, mala wî an nameyên wî bibe, ne jî êrişên ser rûmet û şana wî. Herkesî li hemberî destêwerdan û êrişên wilo mafê parastineke asane heye.

Benda 13.

1. Herkesî maf heye ku di nav sînorên.

dewletekê de bi serbestî hatûcûnê bike û cihê niştecihbûna xwe hilbijêre

2. Herkesî maf heye ku ji her welatekî, yê wî bi xwe jî tê de, derkeve û vegeriye jî.

Benda 14.

1. Herkesî maf heye ji ber çewsandinê li welatên din daxwaza penahiyê bike û penaberiyê bi dest xîne.

2. Ev maf li wan kesan nakeve, yên ku ji ber sûceke ne rêzanî an ji ber kirinên dijî amanc û bîrdozên Neteweyên Yekbûyî hatine tawanbarkirin.

Benda 15.

1. Herkesî maf heye bibe xwediyê hemniştîmaniyekê.

2. Nabe ji tukesî bi awayekî remekî hemniştîmaniya wî bête standin, ne jî dibe ji mafê guhartina wê bête bêparkirin.

Benda 16.

1. Jin û mêrên resêw, bê tu bendên ji ber nijad, netewahî an olê, mafê mêrkirin an jinanîne û damezrandna malbetekê hene. Di dema ku dibin mêr û jin, di dema domahiya wê tatkiliyê de û di dema berdanê de ew xwedî mafên wekhev in.

2. Mehr tenê bi erêkirina serbest û tewaw, ya kesên ku dixwazin hevdu bibin, dikare bête birîn.

3. Malbet (xêzan) hêmana xwezayî û bingeîn ya civakê ye û xwedî maf e ku ji alî civak û dewletê ve bête parastin.

Benda 17.

1. Herkesî maf heye ku bi serê xwe an tevî kesine din bibe xwedî arzî.

2. Nabe tukes bi awayekî remekî ji arziya xwe bête bêparkirin.

Benda 18.

Herkesî mafê azadiya raman, wijdan û olê heye; di nav vî maffî de jî, azadiya ol an bawerîguhartinê û azadiya derbirina wan bi riya hînkirin, xerîkbûn, parastin û peyrewkirina dab û destûrên wê ol û baweriyê, çi bi tenê an bi komel, çi bi aşkereyî an bi dizî.

Dumahîk di hejmara bê de.